# Girêbesta Elektrîkê

Tekniska verken xwediyê torên elektrîkê li Linköping û Katrineholm e. Girêbesta bi operatorê tora elektrîkê re dilxwazî nîne - divê girêbestek we hebe. Wekî din, pêwîstiya we bi girêbestek dabînkirina hêzê heye. Dema ku hûn bi me re girêbestek îmze dikin, kompanya meya dabînkirina hêzê, Bixia, bixweber ji we re tê destnîşan kirin. Bi Bixia re hûn 100% elektrîka nûjenkirî werdigirin.

Dema sazkirina girêbestek dabînkirina hêzê, divê hûn modela bihayê ku dixwazin, hilbijêrin.  Wekî din, (li gorî ya ku wekî "girêbesta diyarkirî" tê zanîn) dê bihayek zêde ji bo elektrîkê were standin.

## Girêbest:

**Bixia Framtid (Pêşeroja Bixia)**

Metirsiya kêm bi ewlehiya bilind tevlihev dike. Bi Bixia Framtid re, we tê pîka bihayê kêmtir hebe, ji ber vê yekê hûn dikarin ji guheztinên herî mezin ên di bazara elektrîkê de dûr bimînin. Ev girêbestek daîmî ye ku heyamek agahdarkirina 12 mehî heye.

**Rörligt elpris (bihayê guhêrbar)**

Ev tê vê wateyê ku biha di dirêjiya salê de diguhere. Bi giştî elektrîk di zivistanê de ji havînê bihatir e. Ev girêbestek bê maweya mecbûriye, û hûn dikarin her gav cureya girêbestê biguherînin.

Tora elektrîkê = gihîştina elektrîkê li cihê rûniştina we (heta deriyê mala we). Dabînkirina elektrîkê = Rêjeya elektrîkê ya ku hûn di cihê xwe de bikar tînin.

Em li Tekniska verken û Bixia, alîkariya we dikin da ku hûn girêbestek dabînkirina hêzê ya dilxwaz saz bikin. Ji bo ku hûn alîkariyê bistînin û pirsan bipirsin, bi rêya hejmara +46 (0) 771-25 26 27 bi me re telefonê bikin.